

Time codes (every sentence) Format: hh:mm:s	Speaker: Please try to identify the speaker if not then just use Speaker 1,2...	Kurdish Transcription	English Translation
00:00	1	[English]	We are glad to have Badran Jia Kurd, deputy co-chair of the autonomous administration of north and east Syria, or AANES. Join us today. As [Inaudible] has reported for several years now, the autonomous administration has fostered an environment of religious freedom and ethno-religious pluralism that is unique in both the Syrian context and across the region. Badran welcome.
00:23	2	Sipas dikim ez ji bo va kedê we û hewildana we û xebatê we li ser herêma me.	Thank you for your work and your efforts in our region.
00:30	2	Em gelekî kêfxweş in û em sipasiya we dikin.	I am very happy and I appreciate you.
00:34	1	[English]	To begin, could you describe the autonomous administration's vision from religious freedom and mutual respect among different religions and ethnic communities in north and east Syria? How does this vision stand in contrast both to the Asad's regime's use of sectarianism and to the future of [Inaudible] and other segments of Syrian opposition?
00:52	2	Rastî...	In fact,
00:57	2	destpêka çêbûna Rêveberiya Xweser li herêmên me yên bakur û rojhilatê Sûriyê	at the beginning of the establishment of the autonomous administration in our region in north and east Syria
01:05	2	ji boy xwe mebdêa parastina ol û baweriyên esas girt.	,we considered protection of religion and beliefs as our foundation.
01:14	2	Ji boy ku her kesek di baweriyê xwe da azad be,	In order for anyone to be free in their beliefs and ideas,
01:21	2	vê derbarê da gelek îcraatên Rêveberiya Xweser hebûn.	the autonomous administration adopted many measures.
01:27	2	Her wiha bi vî rengî di peymanê civakî da Rêveberiya Xweser bi hinek madeyên esasî tekîd kir li ser baweriyê	Similarly, in the area of social contract, the autonomous administration, with some basic provisions, emphasized

		şexis	the freedom of personal belief.
01:41	2	û weke dîtir hemû grûpên etnîkî, grûpên olî, çandî	In addition, all ethnic, religious and cultural groups
01:47	2	dikanin baweriya xwe yê olî biparêzin bi rêka tenzîm û saziyên xwe.	can maintain their religious beliefs through their organization and centers.
01:55	2	Car dî Rêveberiya Xweser mebdeya jiyana hevbeş,	Meanwhile, the autonomous administration considered the origin and source of coexistence,
02:02	2	yanî jê ra dibêjin Teayîş Mişterek, ew esas girt û li ser vîna xwe ava kir.	or “common coexistence”, as its basis and shaped its structure accordingly.
02:09	2	Ku bi rêka vê mebdeyê ku hîşt ku rê vekir ku hemû pêkhatî,	In this way, it provided the grounds for all sections of society,
02:17	2	hemû ol û bawerî, hemû çand bi aştîyane li geh hevdu û vîk ra jiyana bikin.	all religions and beliefs as well as all cultures to live in peace and harmony with each other.
02:23	2	Ji ber ku herêmên bakurê rojhilatê Sûriyê nemûzeceke biçûk e ji Sûriyê teva.	Because the north and east regions of Syria are a small example of all of Syria.
02:31	2	Lewra di bakurê rojhilatê Sûriyê, gelek ol, misilman, êzidî, mesîhî, elewî, şîşan,	In the north and east of Syria, there are followers of many religions and sects, from Muslims to Yazidis, Christians, Alawites, Chechens (Shishans)
02:43	2	gelek grûpên bawerî û seqafî û etnîkî yên cuda cuda hene.	and many distinct religious, cultural, and ethnic groups.
02:48	2	Lewra Rêveberiya Xweser bi hişmendîya xwe, bi fikr û baweriya xwe	With its mindset, thoughts and beliefs, the autonomous administration
02:56	2	Dikarî ku ji boy va olana û va grûpana hemû bibe sîstîmek ku hemû bi hev ra bi aştî jiyana bikin.	could become a system for these religions and groups to live all together peacefully.
03:03	2	Tu carî Rêveberiya Xweser ferq û cudahî nexiste navberê kesan,	The autonomous administration has never made a distinction among individuals;
03:12	2	ji ber olê wî, ji ber baweriya wî, ku ya ev misilman e, ya ev xirîstiyana e, ya ev êzidî ye,	because of a person's religion, because of his/her beliefs, whether he/she is a Muslim, a Christian, or a Yazidi
03:21	2	û divê mumeziyatên herî kesî ev be ya ew be.	and it has never said there should be a difference between this or that.

03:25	2	Tu ferq û cudatî nexiste navberê wan da.	It made no distinction among them.
03:30	2	Biçûk mezin, ew grûp divê hebûna xwe biparêzin, rengê xwe biparêzin.	Whether they are small or large; these groups must maintain their identity, and they must maintain their characteristics.
03:35	2	Ji ber vê, rêveberiyê deriyê xwe vekir û got ku pêwîst e hemû ol, hemû bawerî	Therefore, the autonomous administration opened its doors and declared that all religions and beliefs are necessary
03:44	2	di nava rêveberî û saziyên rêveberiyê da ciyê xwe bigirin.	to be included in the autonomous administration and its affiliated organizations.
03:48	2	Niha bêyî ku tu grûp û tu ol bêne iqsakirin û li derva bêne hîştin,	Now without leaving a group or religion outside of the autonomous administration,
03:55	2	niha hemû temsîla wan di hemû meclîs û hemû desteyên rêveberî û sazî û dezgehên da cî digirin bi şikleke wekhev, bê ku ferq û cudatî hebe.	all of them are now equally represented in all affiliated assemblies, groups and organizations without any distinction among them.
04:09	2	Meselen bûroya, ofîsa ên karûbarên ola heye, serokê wê misilman e, cîgirê wê yekî Xirîstiyân e, cîgirê wê yê dîtir yek êzidî ye.	For example, there is an Office of Religious Affairs, which is headed by a Muslim, its deputy head is a Christian, and its other deputy head is a Yazidi.
04:19	2	Bi vî şeklî di hemû saziyên rêveberiya xweser da cî digirin, bi şikleke adî.	Therefore, they are normally placed in all autonomous administration organizations.
04:25	2	Weke ku her kes dizane, 2015 şûn va me gellek herêm ji rêxistina tundrew a DAIŞê rizgar kir:	As everyone knows, since 2015 onwards, we liberated many areas from the extremist organization of ISIS:
04:37	2	Minbic, Tebqa, Reqa, dêrazor	Manbij, Tabqa, Raqqa, Deir ez-Zor.
04:42	2	û li pey rizgarkirinê, mubaşeretên, li wê derê meclîsên medenî yên herêmî çêbûn, ji xelkê herêmê.	And after the liberation, indigenous civil councils were formed in these areas.
04:55	2	Bi vî awayî di wan herêman da weke ku êdî rê û mecal vebû ji bo ku her kes baweriyê xwe biparêze.	Therefore, in these areas, the grounds were provided for each person to be able to maintain his/her own beliefs and ideas.
05:13	2	êdî mecal vebû ku her kes ji dest tundrewiya DAIŞê reviyayî,	There was an opportunity for citizens escaping from the ISIS,

05:20	2	weke xirîstiyân, êzidî, şîşan, kurd, yê ku ji dest DAIŞê reviyabûn,	like the Christians, Yazidis, Chechens, Kurds, etc., who had escaped from the ISIS,
05:26	2	piştî rizgarkirinê gelek kes vegeriyân û ji nû va êdî bîr û baweriyaya xwe di herêma xwe ya eslî da meşandin	after the liberation, many people returned and pursued their beliefs in their main areas
05:37	2	û her wiha bû furseteke girîng ji wan herêman da,	and an important opportunity was created for these areas.
05:45	2	Mesaheteke baş çêbû ji boy ku sazîyên medenî, sazîyên jin, yê hiqûqî kar û xebatên xwe bikin.	Desirable conditions were created for popular and civil organizations, women's communities and legal communities to do their job.
05:56	2	Weke ku êdî hişmediyeke tesamuha dînî û azadiya ol û baweriyê bi şekleke baş pêş ket di wan herêma da.	A mentality of religious tolerance and freedom of religion and belief developed appropriately in these areas.
06:10	2	Rast e ku hatineke girîng di wan herêmên rizgarkirî da çêbû, lê feqet her tiştê temam nebû.	It is true that there was an important comeback in the liberated areas, but it did not end there.
06:18	2	Yanî hîna kar û xebatên me dewam dikin, li tevahî bakur û rojhilatê Sûriyê,	That is, our activities are still going on in all areas of northern and eastern Syria,
06:24	2	di herêmên Rêveberiya Xweser da,	in areas under the autonomous administration,
06:26	2	da ku em bikanin mebdê û pîvanên esasî yê ku em pê bawer ji boy azadiya ola û baweriyân,	so that we can deepen and develop further the basic materials and criteria that we believe in for the freedom of religion and belief,
06:35	2	em vîna gav bi gav dixwazin kûr bikin di nav civakaya xwe da pêş va bibin.	and deepen and develop these values step by step within our community.
06:43	2	Bi rastî ji ber ku grûpên tundrew weke DAIŞ, heta grûpê îslamî yê ku niha di bin opozîsiyon da têne naskirin	In fact, because extremist groups such as ISIS and even Islamic groups that are now known as the opposition (Syria) and
06:53	2	û çî rijîma Sûriyê dibi,	also the Syrian regime,
06:57	2	ev siyasetên li ser civakaya Sûriyê pêş xistin	developed policies in Syrian society
07:03	2	û hîştin di nav civakaya Sûriyê da nakokiyên mezhebî û olî û irqî pirr kûr çê bibin bi salan e,	and paved the way for very deep religious and ethnic differences,
07:10	2	bibe nexweşiyek ku pirr bi şikleke xerab hişmeniya civakaya me bandor bike û bibe sedemê gelek pirsgerêkan di nava	and for many years it has become a kind of disease that very badly affects the mentality of our society and creates

		xwe da jiyar bike.	many problems in society.
07:39	2	Wek mînak rijîma Sûriyê ji boy xwe ev nakokiyên mezhebî, olî istiqrar kirin bi şêwazeke siyasî ku, ji bo ku desthilatdariya siyasî ya xwe biparêze û bi vî rengî weke desthilatdariyeke hindikan li ser pirraniya çê kir	For example, the Syrian regime created these religious differences in line with its policy so as to maintain its political dominance, thus creating a form of domination by the minority over the majority.
08:03		Û di vê derbarê da yanî hetanî ku pirr siyasatên cûr bi cûr meşandin ku çawa ev nakokiyên mezhebî, olî kûr bikin ji boy ku di civakê da yekbûn û lihevhatineke civakî çê nebe	And in this respect, it utilized various policies to deepen these religious differences, so as not to allow unity and agreement develop in society.
08:28		Û îrada wan nebe yek, nêrîna wan nebe yek li hemberî rejîma desthilatdar	And to prevent them from being united or have a common view against the hegemonic regime.
08:35		Ji boy wê jî, ji boy ku dsthilatdar û rejîm tim bi hêz û xurt bimîne pêwîst e tim ev nakokiyên mezhebî û olî di civakê da hebin ji bo ku tim vîna bi ser wan zexm bikin.	In order to do this and for the government to always remain strong, religious differences must exist in society and they must be bolded.
08:50		Cardin mînakekê ez bêjim:	Let me give another example:
08:54		Ev rejîm bi pirr rengî qebûl nake. Pirrengiya ol û baweriyar, zimanan, çandan qebûl nake. Yek reng e	This regime does not accept diversity. It does not accept the diversity of religion, belief, language and culture. It has only one spectrum and one color.
09:04		Mînak ji bo serokomarê Sûriyê bibe serokomar gerek e olê wî baweriyar wî misilman be. Gellek kes dizane li Sûriyê gelek ol û bawerî hene. Yanî çima şertekî wisa. eva delîl e bo ku tu renekî din qebûl nake û bi yek hişmendî dixwaze vî welatî bi rê ve bibe.	For example, in order for a person to become the president of Syria, his religion must be Islam. Everyone knows that there are many beliefs and religions in Syria. Why should there be such a condition? This is the reason why this regime does not accept any diversity and wants to run this country with only one mentality.
09:30		Di Sûriyê da ji boy serokomarê bê hilbijartin, şertek gerek e dîne wî olê wî misilman be.	In Syria, the most important requirement for someone to be elected as president is that he must be a Muslim.
09:43		Her wiha ji boy Êzdiyan jî di hemû nasnameyên wan da dinivîsînin misilman in, nanivîsîn Êzidî ne.	In addition, in the identity cards of all Yazidis (Yazidi followers), Islam has been mentioned as the religion. Izadi

			is not mentioned.
09:54		Yanî weke bi şekleke fermî jî bi olê Êzdiî îtiraf nakin, qebûn nakin.	That is, they do not officially accept Izadi religion. They do not admit it.
10:01		Aliyekî dîtir ev grûpên tundrew yê bi navê Oposîziyonê tev digerin. Bi taybet niha girêdayî Tirkiyê	Meanwhile, there are extremist groups known as the Syrian opposition, particularly now that they are affiliated to Turkey.
10:10		Ev grûp jî temamen bi hişmendî û bi zihniyet û eqliyeta Îslama Siyasî tev digerin û xwe birêxistin dikin. Xwe tenzîm dikin	These groups also behave based on the mentality and logic of political Islam and they organize themselves on that basis.
12:25		Teb'î, ku her kes dizane Îslama siyasî ji boy ol û baweriyên tê çî maneyê	Without a doubt, everyone knows what political Islam means to religions and beliefs.
10:35		Çawa her kes ne li gorî baweriya wan dikin Kafir û Mulhid û şerê wan dikin	That is, those who have different beliefs with them are considered infidels and atheists and are thus attacked.
10:45		Ji boy vêna di herêmên dagirkirî weke Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî	For this reason, in the occupied areas such as Afrin, Sari Kani (Ras Al-Ain) and Girê Spî (Tel Abyad)
10: 54		Her kes, heta misilmanên kurd, êzdî, şîşan di van herêmên dagirkirî da rastî kiryarên pirr xirab tên.	Everyone knows that even Kurdish Muslims, Yazidis and Shishanis face very harsh behavior in these occupied areas.
11:05		Tên girtin, tên kuştin, jin, keç tên serjêkirin	They are arrested and killed. Women and girls are beheaded.
11:09		Bi darê zorê zarokên jin tên zewicanidn bo şervanên xwe. Her wiha dest davêjin ser malê vana, milkê vana	Young girls are forcibly married to their fighters. They also loot their property and houses.
11:17		Ku dibêjin ev ne misilman in. ew dikarin hemû rengên tehdedariyê li ser wan bikin û li ser wan bimeşînin	They say they are not Muslims. Therefore, they can use all kinds of aggression and threats against them.
11:27		Bi dehan mezarên wan û me'beyên Êzdiyan xira kirin	They destroyed dozens of Yazidi shrines and temples.
11:33		Bi çavê weke kafir lê dinêrin. Heqê wan ê jiyane tune, bi	They look at them as infidels. They say they have no right

		vî şeklî dibêjin	to life. This is what they say.
11:39		Ji bo wê jî kiryarên ne-însanî, sûcên şêr derheqê hemû ol û baweriyên di wê herêmê da tên kirin.	For this reason, they commit inhumane acts, war crimes against all the beliefs of this region.
11:48		Mîsal, gelê Efrînê pîrriya xwe, Êzîdî tê da hene, Elewî tê da hene	For example, among the people of the Afrin region, many of whom are Yazidis, many are Alawites.
11:56		Lê ji bo Gelê Efrînê wiha digotin, digotin ku misilmantiyê nizanin. Ji xeta misilmantiyê dûr ketine. Bûne Kafir.	But this was said about the people of Afrin; they said they did not know how to be a Muslim. They said they were out of the Muslim line and they had become infidels.
12:04		Ji bo wê jî em hatin ku em gelê Efrînê fêrî misilmantiyê bikin	That is why we have come to teach the people of Afrin how to be Muslims.
12:10		Ku mebdê' û pîvan û teafîmên Îslamê çî ne, ji xwe em fêrî gelê Efrînê bikin.	We are here to teach the people of Afrin what the principles, standards and teachings of Islam are.
12:17		Bi rastî ji ber van kiryarên van girûpan û êrîşên dewleta Tirkîyê li ser van herêman, Efrîn, Girê Sipî, Serê Kaniyê	In fact, because of the actions of these groups and the Turkish attacks against these areas, namely Afrin, Girê Spî and Sari Kani,
12:27		Zêdetirî nîv milyon însan penaber bûne, ji cî û warê xwe derketine	more than half a million people have been displaced and are far from their homes.
12:31		Gelek ji wan niha di kampan da ne û gellek ji wan ew malbatên Êzîdî ne, Elewî ne, kurd in ji xwe	Many of them now stay in camps, and many of them are Yazidi, Alawite families, who are Kurds.
12:44		Bi vî rengî niha di rewşeke penaberiyê ya pîrr zor û zehmet da jiyan dikin	Therefore, they are now in a very difficult situation and in displacement.
12:50		Û bê ku piştgiriyeke cîhanê ji boy ew xelkê penaber bê kirin.	And without the support of the international community for these refugees.
12:56	1	[English]	You served and held a hearing in June 2020 to discuss religious freedom conditions specifically in northeast Syria,

			including areas in AANES governance. Now two years later, how have the conditions involved, how has the AANES practically worked to implement its stated commitments to religious and ethnic pluralism and inclusiveness?
13:17		Belê, Rastî. Weke ku me got em weke Rêveberiya Xweser li bakûr û rojhilatê Sûriyê xebatên xwe pirr alî pêş dixin, dimeşînin	Yes; In fact, as we have said, we, as the “Autonomous Administration of North and East Syria” carry out our comprehensive activities.
13:11		Ji bo ew mebdê' û baweriya me yî heyî ku ji boy parastina olan û ji boy jiyana hevbeş, kûrkin, pêşxistin di nava civaka me yî pirr-reng da	Because of our existing beliefs and standards regarding the preservation and fear of all religions and for their coexistence, their deepening and development in our diverse and colorful society
13:40		Em li ser vê xebateke girîng dikin	we attach great importance to this issue
13:43		Em dixwazin vê hamişê hîn zêdetir pêşde bibin.	We intend to develop this with more and more speed and acceleration
13:46		Ku em çanda tesamuha dîniyê xurt bikin	To strengthen the culture of religious tolerance and accepting others
13:51		Em çanda jiyana hevbeş, te'ayîşa hevbeş em pêş bixin û kûr bikin.	To strengthen the culture of coexistence and shared life
14:00		Ew rewasibê seqafeta selebî (??) ya ku ji aliyê dagirker û rejîm û van grûpên tundrew va hatiye çêkirin	This has paved the way (Arabic: روايب) for the rigid (ambiguous) culture created by the occupiers and the regime (Syria) and these extremist groups.
14:08		Em li dijî wê tekoşîneke pirr bi hêz didin.	We are doing a very strong job against this.
14:15		Her wiha car dî li pêş me wek Rêveberiya Xweser peymanî civakî heye, em çê dikin	There is also a “social pact” before us as “the autonomous administration.”
14:26		Di wê derê da me gelek cihan tekîd kiriye ji boy parastina olan û çandan û azadiya baweriyên	In this regard, we have emphasized in many places the preservation of religions and cultures and freedom of

			opinion
14:35		Û vê derbarê da xebateke girîng tê kirin	And important work is being done in this regard
14:38		Û dûv ra zaten em ê derbasî hilêbijartinan bibin di hemû kantonan da	And then we will hold elections in all the cantons
14:42		Li gorî peymanê civakî ya nû	based on the new social pact
14:44		Em bawer in bi vê ra hin guhartinên hînma girîngtir û xebateke li pêş wê çê bibe derkeve holê.	We believe that along with this, more important changes will follow, after what will be done.
14:53		Lê ev tijba demokratî, ev jiyana hevbeş, ya ku hemû çand û ol bi hev ra jiyana bikin li bakûr û rojhilatê Sûriyê da	But in this democratic model, this coexistence in which all cultures and religions live together in the north and east of Syria.
15:07		Teb'î, ev hêzên nijadperest, ev hêzên mezhebî, olperest li hemberî vê tejbê û projeya siyasî ya ku heyî, li hemberî vê xwe ranagirin, bi çavsorî nêzik dibin.	It is natural that racist and religious forces consider this political model and process as a threat and they do not tolerate.
15:22		Naxwazin ku ev teşbe biçê ber bi serkeftinê	They do not want this model to lead to success.
15:26		Vêna... nihêrikî çî ji aliyê Tirkiyê va pîrr êrîşên dijwar çê bibin li ser herêmê,	Therefore, there were very difficult attacks on our regions by Turkey
15:34		Çî ji aliyê rejîma Sûriyê da eger êrîşên leşkerî nebe, lê feqet êrîşên siyasî, rêşkirin, teşhîrkirin, di sûreteke xerab da ye	and by the Syrian regime. Although they are not military attacks, political attacks and propaganda occur tragically.
15:48		Hertim li ser van herêmên me heye	There are constant attacks against our regions
15:51		Ji bo ku ev tejbê neçe serkeftinê	Until this model wins.
15:54		Ji boy me jî niha di vê demê dda tehdîda stratejî ya ku li ser ev istiqrar û jiyana hevbeş û ev hişmeniya ku hemû ol bi hevdu ra jiyana bikin	For us, too, now and at this time, it is a strategic threat to the peace and coexistence in which all religions and faiths live together.
16:08		Tehdîda stratejîk li ser vêna, êrîşên dewleta Tirkiyê ye	The strategic threat against these is the attacks by the

			Turkish government
16:11		Eva ji boy me pirsgirêkeke pirr girîng e ku niha li pêşberî me derdikeve	This is a very big problem for us that we are facing now
16:17		Ku her kes dibîne ku dewleta Tirkîyê her roj gefan û tehdîdan dide.	Everyone is witnessing that the Turkish government is making threats every day
16:25		Û heta êrîşên bi dronan bi topan, rojan êrîş çê dibin	And there are even drone and artillery attacks every day.
16:31		Hema tenê di sala derbasbûyî da zêdetirî 35 êrîşên bi dronan li ser cihên sivîl û xelkê medenî çê bûn	Last year alone, there were more than 35 drone strikes against residential areas and ordinary citizens
16:44		Zêdetirî 45 kes birîndar bûn û jiyana xwe ji dest dan	More than 45 people were killed or wounded
16:49		Gelek ji wan jin in, zarok in, sivîl in û heta hinek jê brûtanên (??) QSDê yên ku hevkarê Koalîsiyonê ne, yên ku bi hev ra dijî terorê şer dkikin, kar dikin	Many of them were women, children, ordinary citizens, and even many (ambiguous) members of the QSD (Syrian Democratic Forces) who are collaborators of the international coalition; those who fight and work together against terrorism.
17:06		Bi rastî rojane, xelk û însanên medenî, sivîl di herêma me da bi van êrîşên Tirkîyê têne qetilkirin	Actually, every day, ordinary people and citizens in our region are killed as a result of these Turkish attacks.
17:017		Jin û zarok jiyana xwe ji dest didin	Women and children lose their lives
17:20		Divê ku li hemberê vêna tewequfek, helwesteke xurt ji aliyê civaka navdewletî va hebe.	There needs to be a strong stand and approach by the international community against these.
17:27		Tu carî qetilkirin û kuştina medenîyan nayê qebûlkin.	Murder and killing of ordinary citizens is never accepted.
17:32		Çawa ku îro her kes li dijî komkujiyên ku li Ukraynê çê dibin divê dijî Tirkîyê jî derkevin û dijî vê yekê jî helwesteke wan hebe	Just as everyone today stands up against the killings in Ukraine, they must stand up to Turkey and take a stand against it.
17:45		Bi rastî êrîşa dawiyê hikûmeta Amerîkayê îdane kir. ew êrîşa dawiyê ku li Kobaniyê çê bû	In fact, in the recent attack, the US government condemned it; an attack that took place recently in Kobani.

16:56		Teb'î girîng bû helwesta hikûmeta Amerîkayê li dijî wê êrîşê.	Naturally, the US government's stance against this attack was important.
18:01		Lê divê destpêkê helwesteke tund hebe ku êrîş çê nebe, rêk pêş êrîşa bigire. Ev ya girîng e.	But there must be a strong position at the beginning so that the attack does not take place and prevents the attack. this is important
18:11		Çimkî ku ev êrîş wisa bi netîce dibe ku dê rikî (???) rêxistinên tundrew weke DAIŞ taybet ji va êrîşana fayde bigirin û	Because the result of these attacks is that extremist groups such as ISIS, in particular, will benefit from these attacks.
18:25		Xwe birêxistin bikin xwe zindî bikin û ji nû va çalakiyên xwe yên terorî din hindira Herêmê da pêş bixin.	They organize themselves; they revive themselves and carry out their terrorist acts in the region again and again
18:33		Ev jî car dî xeteriyeke mezin e ji boy her kesî	And this is once again a great danger for everyone
18:37		Di vî warî da, dewleta Tirkîyê roleke pirr xerab li ser vê dilîze	The Turkish government has a very negative role to play in this respect
18:45		Bi hewildan û cihûdên tealofa dowelî li dijî terorê ji wê ra dibe asteng	Turkey is an obstacle to the efforts of the international coalition against terrorism
18:45		Nahêle ku ev biçê serkeftina dawiyê	It does not allow the ultimate success in this respect
18:58		Ji boy wê jî divê rewşa Tirkîyê bi va dewra xwe ya selbî (???) di tekoşîna dijî terorê da, rewşa wê di ber çavan ra bê derbaskirin û helwestek li beranberî wê da	Therefore, it is necessary to consider Turkey's behavior and this (ambiguous: irrational) role in the fight against terrorism and to take a stand against it.
19:13		Erê, bi kurtahî Tirkîye dixwaze ku ew herêma ol û bawerî tê da parastî ne	Yes; in short, Turkey wants this region where religions and beliefs are safe and protected.
19:19		Dixwaza van herêmana veguherîne wek herêmek wek Idlib, Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê	It wants to turn these areas into areas like Idlib, Gary Sepi and Sari Kani.
19:26		Ku çawa grûpên tundrew lê jiyayê dikin	Areas where extremist groups dominate
19:30		Dixwaze weke van herêman bimîne û ev rewşa azadiya	It wants it to be like these areas and to eliminate these

		olan û baweriya li vê derê têk bibe. Xira bike û aloziyê çê bike. Bi teavhî armanca Tirkiyê ev e.	conditions of freedom of religions and beliefs in them. It wants to create conflict. This is the whole purpose of Turkey.
19:45	1	[English]	Thank you. There are critics of the AANES who accuse it of elevating Kurdish nationalist interests above the interests of all who live in northeast, Kurdish, Arabs, Syrian Izadis, and others. There are other members of minority groups who fear that supporting AANES will make them specially-vulnerable if the regime returns to to the northeast. How do you respond to these criticisms and fears?
20:11		Rast e. ev êrîşên Tirkiyê, milekî wê her rojê ku çê dibin, gelek fukaran çêl dikin di nav civaka me da	It is true. The daily attacks of Turkey cause a lot of concern in our society
20:25		Dibêjin hevkarên me yên navdewletî di serî da Amerîka, em bi hev ra ne, li dijî DAIŞê terorê şer dikin	International partners, led by the United States, say we are together and we are fighting ISIS terrorism
20:36		Îro ew bi xwe jî li vê derê li Herêmê ne.	Today, they themselves are in our region
20:40		Wextê ku di ser van hêzan hemûyan, ev êrîşên Tirkiyê çê dibin, fukar û metirsî çê dibin.	Despite all this, there are concerns when such attacks on Turkey take place
20:49		Yanî heqeten, weke ku bêjin eger pêşiya Tirkiyê nayê girtin ku her Tirkiye bixwaze êrîş bike	That is, in fact, people say that if the Turkish attacks are not stopped, it will attack them every day
21:00		Bixwaze me qirr bike, ji boy vê jî metirsîneke wisa heye	It wants to eradicate them; that's why there is such a concern.
21:06		Car dî metirsîna xelkê bi aliyan da bi vî rengî heye ku dibêjin siyaseta Amerîka di herêmê da ne zelal e.	Our people are concerned that US policy in the region is vague and not transparent.
21:22		Ji boy pêşeroja Herêmê çi difikirin nediya e	It is unknown what plans they have for our region in the future.
21:26		Dibêjin mumkin e di wexteke nediya da hema paşda	They (the people) say, the US may withdraw at an

		vekişe.	unknown time.
21:31		Ji bo wê jî mumkin e car din rejîm bê herêmê û saziyên emnî û ewlehiyê yên rejîmê vegerin	Therefore, the regime (Syrian government) may re-enter the region and the security apparatuses of the regime may return.
21:37		Ji nû va rejîm ew siyasetên xwe yên istibdadî li ser xelkê pêş bixe.	That the regime will pursue its authoritarian policies against the people once again
21:42		Ji bo wê jî ew cihê qeleqî û cihê dudiliyê ye li cem xelkê û nikarin mewqif û helwesta xwe qismet ji wan zelal bikin li kêleka Rêvebreriya Xweser	For this reason, there is hesitation among people, and they cannot clarify their position alongside “the autonomous administration.”
21:56		Meselen li herêmên Dêrazorê da hinek kesayet yên ereb heta niha dudil in li kêleka Rêveberiyê bin an li kêleka Rejîmê.	In the Deir ez-Zor region, for example, some Arab figures have so far been in doubt whether to side with the Palestinian Authority or to side with the Syrian government.
22:10		Her wiha keşeyên xirîstiyanan yên heyî di herêmê da hinek ji wan têkiliyab xwe li gel rejîmê hene	There are also Christian figures in the region, some of whom are linked to the Syrian government.
22:19		Tim hesab dikin ku mumkin e rojekê rejîm vegere, têkiliya xwe bi rejîmê ra qut nakin.	They always keep in mind that the Syrian government may one day return; therefore, they do not cut ties with the Syrian government.
22:24		Ji bo wê jî sedemê vê qeleqê vê metirsiyê rewşa ku di hundir herêmê da diqewime	Because of this hesitation and lack of transparency, this concern exists within our region.
22:31		Û ji ber vîna qerara dawiyê ji aliyê pîrr kesan va nayê dayîn ku tev li Rêveberiya Xweser bibin.	That is why many people do not express their final decision to join the autonomous administration.
22:44		Bi rastî paşdavekişandina hêzên amerîkî ji serê Kaniyê û Girê Sipî di sala 2019an da	In fact, the withdrawal of US forces from Girê Spî (Tel Abyad) and Sari Kani (Ras Al-Ain) in 2019
22:54		Vîna Intibaeke nebaş li cem xelkê Herêmê çê kir	created an unfavorable mentality among the people of the

			region
22:59		Û her wiha bûye cihê metirsînê	and it has also caused concern
23:03		Ji bo vê jî xelk hertim dibêje divê ku tecrubeya Serê Kaniyê û Girê Sipî, ew senaryo careke din dubare nebe.	For this reason, people always say that it is necessary for the experience of Sari Kani and Girê Spî not to allow this scenario happen again.
23:14		Her daxwaza wan a esasî ev e ku tejba Serê Kaniyê Girê Sipî dubare nebe.	Their fundamental request is that the case of Sari Kani and Girê Spî should not be repeated.
23:21	1		How has the Turkish military's invasion in control of a (inaudible) in 2018 and a much wider stretch in Syrian territory that you've been talking about in 2019, how has it impacted both religious and ethnic minorities that live in those areas as well as the autonomous administration's ability to safeguard those communities.
23:42		Rastî... Êrîşa li ser Efrînê di sala 2018an da ... cara yekê êrîşa Tirkiyê ya bihêz a xwe ya leşkerî bi tank û topên xwe û balefirên xwe êrîşek pêk anî, rasterast kete nav da û beşek ji Sûriyê dagir kir.	In fact ... in the attack on Afrin in 2018, it was the first strong Turkish military attack with tanks, artillery and warplanes on our region. As a result, it entered the region directly and occupied part of Syrian territory.
24:05		Û beşek ji herêmên Rêveberiya Xweser dagir kir	It also occupied some areas under the control of the Autonomous Administration.
24:10		Teb'î vêna pirr bi êş bû	Naturally, this was very painful.
24:16		Bû sedem bi sed hezaran xelkê Efrînê, belkî 300 hezar kes ji xelkê Efrînê penaber bibin	The attack displaced hundreds of thousands of people in the Afrin region, or about 300,000 people in Afrin.
24:24		Her wiha weke ku me got lin wê derê li Efrînê jiyaneke hevbeş û azadiya olan hebû û hemû olan bi hev ra jiyandikir	As we have said before, there was a kind of peaceful coexistence and freedom of religions in Afrin, and all religions and beliefs lived together.
24: 33		Cara yekê di siya Rêveberiya Xweser da gelê Êzidî kanîn li	For the first time, thanks to the Autonomous

		wê derê hemû minasibetên xwe yên olî pîroz bikirana	Administration, the Yazidi people were able to hold all their religious celebrations in that area.
24:43.		Cejnên xwe poîroz bikirana bi azadî, hemû ibadetên xwe bi azadî bikirana	They were able to hold their festivals freely and perform all their worship freely.
24:49		Lê piştî dagirkeriya dewleta Tirkîyê ew rewş nema,	But after the occupation by the Turkish government, this situation no longer exists.
24:54		Temamen eksî wê vegeriya li wê derê û weke me berê jî got, rewşeke pîrr aloz çê bû	Rather, it happened there quite the opposite, and as we said before, the situation became very complicated.
25:02		Êdî di wê derê di asta guhertina demografîk, asta sûcên şêrr, sûcên li dijî mirovan rojane pêş dikevin li wê derê	Demographic change, war crimes, and crimes against humanity are happening on a daily basis in that region.
25:15		Û li pêş çavên dinyayê hemû û eynî bi wî şiklî li Serê Kaniyê û Girê Sipî eynî tişt pêş ket	And exactly the same thing is happening in front of the eyes of the world in Sari Kani and Girê Spî.
25:26		Tebî ev dagirkerî li Serê Kaniyê, Girî Sipî û Efrînê moraleke mezin da teror, DAIŞ û ew rêxistinên tundrew	It is natural that the occupation of Sari Kani, Girê Spî and Afrin strengthened the morale of terrorists, ISIS and extremist groups.
25:42		Yên ku dixwazin hemû olan biperçiqînin û her kesî dikin Kafir û Mulhid û wan moral û cureteke mezin girt ji van êrîşên dewleta Tirkîyê	Those who want to trample on all religions and beliefs and call all people infidels and atheists, and those who gained courage and morale as a result of the Turkish attacks.
25:53		Ji bo xwe piştekan girtin û li ser wî esasî kar û xebatên xwe yên tundrewiyê pêş xistin	They received support and thus expanded their extremist actions.
26:05		Rastî weke berê jî me got, niha ji wan herêmen dagirkerî zêdetirî nîv miliyon însan penaber bûn	Actually; as we said before, more than half a million people are now displaced from this occupied area
26:14		Jê bi hezaran malbatên Êzîdî ne, elewî ne, şîşanî ne.	Thousands of families that are Yazidi, Alawite and Shishani.
26:19		Ji olên ne misilman û her wiha bi hezaran misilmanên herêmê jî penaber bûn	Followers of non-Islamic religions as well as thousands of Muslims in the region were displaced.

26:27		Îro di şert û mercên pirr zehmet da jiyan dikin li nav kampan da	Today, they live in very difficult conditions in the refugee camps.
26:31		Jê penaber bûne, li hemû welatên cîhanê belav bûne	Some of them have become refugees and have spread to all countries of the world.
26:35		Rewşeke însanî ya pirr bi êş derkete holê	The human condition is very complicated.
26:40		Ji bo vê jî gelê me her daxwaza wan a esasî û sereke ji hemû hêzên navdewletî û mezin	For this reason, the main and fundamental request of our people from all international and major powers
26:51		Ev e ku careke din ew senaryoya Efrînê, Girê Spî û Serê Kaniyê tekrar nebe	it that the scenario of Afrin, Girê Spî and Sari Kani should not be repeated in this region.
26:55		Eksî vêna her kes dixwaze ku vegere cih û warê xwe, bi aştî careke din weke berê jiyan bikin	On the contrary, people want to return to their homes and live together in peace and tranquility as before.
27:07		Bê guman ew sûc û kiryarên ku li wan herêman têne kirin ewna bi şekleke fermî û muweseq di raporên hiqûqî yên netewên yekbûyî da jî hemû haatine ziman	Undoubtedly, the crimes and actions that take place in those areas are also officially and credibly mentioned in the UN legal reports.
27:21		Vêna êdî her kes dizane di van herêman da çi têne kirin	Everyone knows what is happening in these areas.
27:27		Car dî gelê me saziyên hiqûqî û em vê derbarê da em bêjin kesên berpirsyar ji van sûc û kiryarên ku kirine divê hesab bê pirsîn û werin dadgehkirin	Our people, human rights organizations and we reiterate in this regard that the perpetrators of these crimes and actions must be brought to justice.
27:40		Weke çawa îro rêberiya Amerîka û welatên Rojava dibêjin ku kesên di rejîma Sûriyê da yên ku komkujî çê kirine û sûc kirine, gerek e bêne darizandin, bêne muhasibekirin	As the United States and other Western countries say these days, those who committed massacres and crimes within the Syrian government need to be tried and punished.
27:55		Her wiha eynî bi vî şeklî ev grûpên ên ku girêdayî Tirkîyê û heta berpirsyarên Tirkîyê û rêveberên Tirkîyê bi xwe jî divê kesên van kiryanan dikin, ew jî werin darizandin û hesab bê pirsîn.	Similarly, the groups affiliated with Turkey and even the Turkish authorities and officials who committed these acts must be punished.

28:11	1	[English]	Thank you. We've already talked a little about US foreign policy, but how does that, US foreign policy, toward Syria generally and north and east specifically, impact the lives of religious and ethnic minorities under the autonomous administration and its ability to carry out stated commitments to religious freedom?
28:31	2	Bi rastî ...siyaseta Amerîka di herêmê da bi bandor û tesîr e.	In fact ... US policy is influential in the region.
28:40	2	ji boy vêna eger planeke wan wazih û birêkûpêk hebi, em bawer in wê ji boy xelkê herêmê bibi piştgiriyeke mezin.	Therefore, if they have a clear and organized plan, we believe that it will bring great support to the people of the region.
28:58	2	ya dîtir, di herêma me da ev têkoşîna ku li dijî terore hate kirin, ew grûpên tundrew hatin binxistin,	On the other hand, the war happened against terrorism in our region in which the extremist groups were defeated,
29:08	2	bi piştgiriya Amerîka û hevalbendên me yê tehalufê (itilaf) çê bûn. Ev cihê rêz û teqdîrê ye teb'î.	this was with the support of the United States and our allies in the (international) coalition. Naturally, this is something that should be appreciated.
29:19	2	Û her wiha hebûna Koalîsiyonê û hêzên amerîkî û berpîrsên amerîkî di hindir herêmê da teb'î girîng e	In addition, the presence of the coalition and American forces and officials inside the region is definitely important
29:31	2	û coş û moralekê didi ku aramiyek hebi, istiqrarek hebi,	and there is hope for security and stability.
29:40	2	bi vî awayî carek din em dibêjin, em bi hêvî ne	Therefore, we would like to state again that we hope;
29:47	2	hebûna berdewam a tehaluf û hêzên amerîkî ji boy jiyana hevbeş girîng e.	the continued presence of the coalition and American forces is important for coexistence.
29:58	2	heyên çareseriyêke siyasî çê bibe, girîng e hebûna wana di hindir herêmê da.	Their presence inside the region is essential until a political solution is found.
30:06	2	ji boy vê jî divê di çarçêva va siyaseta ku çawa jiyaneke hevbeş, parastina hemû çandan û olan tev bigere,	Therefore, it must act within the framework of this policy of coexistence, preservation of all cultures and religions,
30:18	2	em dibêjin bandor û tesîreke wê girîng heye di vê derbarê da.	and we declare that it has an important impact in this regard.
30:25	2	Em dibînin nêrîna me û rêveberiya Amerîka di va mijara,	We say our views and those of the US administration on

			this issue that
30:31	2	hemû netew,hemû çand, hemû ol û bawerî bi hev ra jiyankirin,	all nations, all cultures and all religions and beliefs should coexist,
30:36	2	nêrînê me weke hev e û em her du alî jî piştgirî didin vê fikrê û vê projê,	our views are the same, and both sides support this idea and project.
30:43	2	ji bo wê jî em dibêjin	That's why we say,
30:48	2	furseta serkeftina vê projê bi piştgiriya Rêvebiriya Amerîka wê deha zêde bibi.	the success of this project will increase dozens of times with the support of the US administration.
30:55	1	[English]	Thank you so much Badran for sharing your perspective today on behalf of the autonomous administration in north and east Syria. We really appreciate your joining us.
31:03	2	Gelek sipas. Sipas dikim.	Thank you very much. Thank you.
31:06	2	Em kêfxweş bûn car dî di gel we.	We were very delighted to be with you again.
31:08	2	îşalla em ji nêzik da hevdu li vê derê bibîn.	God willing, we will meet closely here.